

Jîngeha Eyaletê ya Karûbarên Penaberiyê, Berlin (LAF)	Rêzîkname ji bo navendên pêşwaziyê û jîngehê hevpar li eyaleta Berlînê	Rûpel 1 / 9
		Jê pêve: 07/12/2020

Hûn bi xêr hatin jîngeha koçber û penaberan a li eyaleta Berlînê.

Ev rêzîkname qaîdeyên ji bo jiyaneke hevbeş a li vê jîngehê di hundirîne. Ev qaîde ji bo kesên li vê derê dijîn û dixebitin û her wiha ji bo hemû serdêran derbasdar in. Li vir armanc ew e ku jiyana rêzgir û aram a hevbeş bête pêşkêşkirin.

Li Almanyayê, ji hêla qanûnî ve her kes wek hev e. Ev qaîde tê wê wateyê ku tu kes dê ji ber cinsiyet, netewe, ziman, welat û mîrateya xwe, ol û baweriyaya xwe yan jî dîtina xwe ya siyasî, meyla xwe ya cinsî, temen û nijada xwe rastî cudakariyê neyê û cudakarî lê neyê kirin. Cûdakariya li ser nijadê di heman demê de mirovên ku tenê ji ber taybetmendiyên derveyî yê wekî rengê çerm tene cûdakirin jî digire nav xwe. Çênabe ku tu kes ji ber astengdariya xwe rastî cudakariyê were.

Bi taybetî, di qanûnên dewleta Almanî de yeksaniya jin û meran weke parçeyek mafên bingehî hatiyê piştrastkirin. Ev tê wê wateyê ku jin û mêr di hemî warên jiyane de xwediyê heman maf û peywiran in. Çênabe ku tu kes taybetî ji ber cinsiyeta xwe rastî cudakariyê were.

Li Dewleta Almanyayê kesên ku meyla wan li ser hemcinsên xwe heye yan jî ji aliyê cinsî vê meyla wan li ser herdu cinsan heye (gey, lezbiyen, bîseksuel) û kesên ku xwe daxilî cinsiyeteke diyarkirî nakin yan jî kesên ku cinsiyeta wan a biyolojîk û nasnameya wan a cînsî ji hev cuda ne (întersex yan jî transeksuel) xwediyê heman maf û azadiyan e û çênabe ku însanên wiha ji ber meylên xwe yê cinsî yan jî nasnameyên xwe yê cînsî rastî cudakariyê bînin. Ji ber vê yekê jî, rûniştvanên jîngehê divê rêz û hurmetê li van mirovan bigirin û bi tu awayî helwesteke neyarane nîşanî wan nedin û çênabe ku cudakarî li wan bê kirin.

Çi demeke dirêj û çî jî demeke kurt, heçî kesên ku li vê jîngehê dimînin, pêwîst e pabendî van qaîdeyên di vê rêzîknameyê de bibin.

Beşa 1emîn - Mafê biryar dayîna têketinê

1. Mafê destûrdayîna têketinê, mafekî wiha ye ku biryarê dide ku dê kî bikaribe têkeve wargehê û avahiyê û li wir bimîne û dabînkaran xizmetguzariyê û xebatkarên ewlehiyê, serdêr û xwebexş û hevkar dê çawa tevbigerin, diyar dike.

Dabînkare xizmetguzariya ewlehiyê li ser navê eyalata Berlînê biryara mafê têketinê dide û rêzîknameyê tetbîq dike. Di vê mijarê de, dabînkare xizmetguzariya ewlehiyê piştgiriya dide.

2. Pêwîst e dabînkare xizmetguzariya ewlehiyê û xebatkarên ewlehiyê rêzê li nepeniya kesên din ên ku li baregehê dimînin bigirin.

Pêwîst e dabînkare xizmetguzariyê, derbarê dema muayeneya rûniştvanan de û li xizmetên tenduristiyê yê asayî bişewîrin û agahiyên bidin. Bi destûr û pêş agahdarkirina kesên li jîngehê dimînin, li hizûra wan û bi rêzdariya li nepeniya wan, dem bi dem çêdibe ku lêkolîn bînin kirin.

Xebatkar, berî ku bikevin jûrê divê li derî bidin û li bendê bisekinin ku yê/a li hundir destûra têketine bide.

Dabînkare xizmetguzariya ewlehiyê û xebatkarên ewlehiyê û berpîrsên rêveberiyê, eger metirsiyek tine be, qedexeyê ye ku têkevin jûra rûniştvanan. Xetereyek bi taybetî rîska xetereya zirara li kesên an jî mal di hewîne. Destnedayîna malê li gorî Xala 13an a Zagona Bingehîna dê ji bilî

Jîngeha Eyaletê ya Karûbarên Penaberiyê, Berlin (LAF)	Rêzîkname ji bo navendên pêşwaziyê û jîngehê hevpar li eyaleta Berlînê	Rûpel 2 / 9
		Jê pêve: 07/12/2020

xaniyên taybetî li ser jûreyên li navendên pêşwaziyê û xaniyên hevpar ên penaberan jî derbasdar be. Ev destnedayîn dibe ku tenê li ser bîngehek huquqî bê astengkirin. Bîngehek wusa qanûnî di Zagona Niştinê de heye. Herwiha, lêgerîn tenê bi bîryara dadgehê dikare were kirin.

Ger dema ku karmend têkevin hundurê odeyê de kesek tune be, divê ew bi rêveberiya baregehê re û ravekirinek nivîskî li odeyê bihelin.

3. Xebata ji bo kompaniyekê û her cure çalakîyên bazirganiyê û reklamên ji bo bazirganiyê qedexe ne.

4. Tenê polîs dikarin kontrola çente û dolaban bikin, lê ji bo vêya jî divê egereke qanûnî hebe.

Beşa 2yemîn – Çarçoveya tetbîqkirinê

Ev rêzîkname ji bo hemû avahiyên jîngehê derbasdar e.

Ev xal ji bo hemû kesên li baregehê dimînin, serdêran, xwebexşan, hevkarên û dabînkarek xizmetguzariya ewlehiyê û xebatkarên ewlehiyê derbasdar in.

Beşa 3yemîn – Kesên li baregehê dimînin

1. Kesên ku li jîngehê dimînin, ji bo ku mafê rûniştinê di vê wargehê de bi dest bixin, divê beyannameyê wan a lêçûnên pesendkirî ya fermî hebe yan jî divê ji aliyê Baregeha Eyaletê ya Karûbarên Penaberiyê (LAF) ve cihê ji bo wan hatibe terxankirin.

2. Bi destûra demkî ya rûniştinê mafê rûniştina dayîmî nayê bidestxistin.

3. Ji bo her kesekî/e li jîngehê dimîne nasnameyek tê dayîn. Eger dabînkarek xizmetguzariyê û/yan jî xebatkarên ewlehiyê bixwazin divê nasnameya xwe nîşanî wan bidin û her rûniştvan divê her tim vê belgeye li ser xwe bigerîne.

4. Bi awayekî xurt tê pêşniyazkirin ku ji boyî ku rûniştvan li wargehê bi awayekî çalak beşdarî jiyanê hevbeş bibin, divê dabînkarek xizmetguzariyê û/yan jî rêveberiya baregehê piştgiriya bide vê yekê û li gor xizmetên rast konseyekê niştecihan an jî cûreyên din ê tevlihbûnê ava bike.

5. Hemî rûniştvan neçar in ku elektrîk, av û germê kêm bikar bînin.

6. Pêvekirina antênên derveyî tenê bi razîbûna pêşîn a dabînkerek û li gorî qanûn û rêzîkên ku li eyaleta Berlînê têne sepandin destûrdayîye.

7. Qadên hevbeş yê ku ji bo hejmarek mirov hatine veqetandin, her wiha kesên li wargehê dimînin jî dikarin van cihan bi kar bînin. Dabînkarek xizmetguzariyê demên bikaranînê diyar dikin. Deverên hevpar dikarin bi awayên cûda werin bikar anîn, wekî mînak ji bo civînan, çalakiya fîzîkî, bi hev re temaşekirina TV yê an qursên perwerdehiyê. Karmendên jîngehê dikarin agahdariyên berfirehtir bi were parvebikin.

8. Eger kesek ji rojekê zêdetir bi derbasî li derveyî jîngehê bimîne û here derve (çûyîna nexweşxaneyê, civînên bi berpirsan re yê li derveyî bajêr û sedemên din yê girîng) divê rêveberiya baregehê di derfeta ewil de di vî warî de bê agahdarkirin. Mayîna li derveyî jîngehê, eger derfet hebe ji berê de were plankirin, di zûtirîn demê de divê rêveberiya baregehê bê

Jîngeha Eyaletê ya Karûbarên Penaberiyê, Berlin (LAF)	Rêzikname ji bo navendên pêşwaziyê û jîngehê hevpar li eyaleta Berlînê	Rûpel 3 / 9
		Jê pêve: 07/12/2020

agahdarkirin. Eger kesek ji sê rojan zêdetir li derveyî jîngehê bimîne û ev yek ji ber qisûreke wê kesê be, ew kesê/a li jîngehê mafê xwe yê mayîne winda dike.

9. Ya jêrîn ji bilî navendek pêşwaziyê ji bo niştecihên li jîngehê dimênin derbas dibe:

Di rewşeke nebûna plankirî ya ji sê rojan zêdetir de, cîhê li jîngehê dikare bi şertê ku tunebûn ji ber sedemên girîng hewce be bê girtin (mînak; ketina nexweşxanê, hevdiîna bi rayedarên derveyî bajêr re, destûrdayîna xebata li derveyî bajêr, beşdarî hin bûyerên malbatê yên wekî dawet, cenaze û hwd.). Rayedarên ku alîkariyên civakî peyda dikin divê ji bo vê yekê razîbûna xwe bidin (LAF, navenda kar, nivîsgeha navçeyê).

Ji bo rûniştvanên ku van feydeyan ji LAFê digirin, di nebûna ji ber sedemên diyarkirî de, bê ku cîhê di baregehê de winda bike û hewce bibe ku bikeve jîngehek nû û bi şertê ku tu bîngehên qanûnî yên berevajî tune bin, dikare bi gelemperî heya 20 rojan di saleke salnamayê de destûr were dayîn. Di hin rewşên awarte de jî destûr dikare ji 20 rojan zêdetir were dayîn (mînak; mayînek li nexweşxaneyê ya dirêj).

Pêwîste ku destur ji pêşî de ji LAFê were xwestin.

Ger hûn ne ewle ne ku bi kîjan nivîsgehê re têkilî daynin da ku hûn destûrê bixwazin karmendên jîngehê dikarin alîkariya we bikin.

10. Di rewşên lezgin de (bo nimûne di dema nexweşînek, fişarek yan jî êrîşeke tundkariyê) ji bo kesên li jîngehê dimînin, bikaribin xwe bigihînin wê kesê ji bo têkiliyê kesek tê diyarkirin. Her weha ew dikarin xizmetên lezgin jî bigerin. Karmendên jîngehê herwiha dê hewil bidin ku alîkariya niştecihan bikin da ku bi bûyerên taybet ên bi stres re sereder bikin. Dikarin pirs û pirsgerêkên xwe yên dema karî ji dabînkare xizmetguzariyê û ji sîstema gilîkirinê ya LAFê re bikin (e-name: unterkunft-qs-beschwerde@laf.berlin.de).

Beşa 4emîn - Kesên din

1. Rûniştvan dibe ku di odayên xwe de mêvanan qebûl bikin. Rêveberiya jîngehê hûrguliyên rêzikên serdanê, bi taybetî demjimêrên serdanê, wekî beşek ji mafê destnîşankirina têtetînê bi şewirmendiya LAFê destnîşan dike. Rûniştvan ji qaîdeyên serdanê yên li jîngehê derbasdarin bi rengê guncaw ji hêla rêveberiya jîngehê de bêne agahdarkirin. Di vê agahdariyê de her weha hûrgulî hene ka gelo destûr heye ku serdan tenê li dervayê demên bêdeng ên şevê bîn kirin an jî mêvanên di hin rewşên taybet de dikarin bi şev li jîngehê bimênin.

2. Kesên ku serdana rûniştvanan û aliyên hevkar bike, divê belgeyeke bi wêne (pasaport, nasname, karta sîgortaya tenduristiyê, karta xwendekariyê û hwd.) bi xwe re bigerîne, hem dema têtetînê û hem jî dema derketinê divê li resepsiyonê qeyda xwe çêbikin. Di vê astê de belgeyeke serdêriyê werdigirin. Dabînkare xizmetguzariyê yan jî dabînkare xebatkarên ewlehiyê nikarin agahiyên kesane yên serdêran yan jî dilxwazan tomar bikin, ev yek qedexe ye.

3. Kesên ku bi awayekî der qanûnî li avahiyên dimînin yasayan bînpê dikin, di vî warî de divê berpirsyar bêne agahdarkirin. Dema dilxwaz û serdêran tê nîşandan û divê pabendî bi wê demê bê kirin.

Jîngeha Eyaletê ya Karûbarên Penaberiyê, Berlin (LAF)	Rêzîkname ji bo navendên pêşwaziyê û jîngehê hevpar li eyaleta Berlînê	Rûpel 4 / 9
		Jê pêve: 07/12/2020

Beşa 5emîn – Paqijî û nîzam

- Li kolan û deverên derveyî yê jîngehê vexwarina alkol an tiryakan qedexe ye.
- Li hemû deverên avahiyê kişandina nêrgîlê û cîgare qedexe ye. Kesên li jîngehê dimînin, tenê li cihên derve ku ji bo kişandina cîgareyê hatine diyarkirin, dikarin cîgarê bikêşin. Kesên li jîngehê dimînin, divê van deveran paqij bihêlin.
- Divê rûniştvan jûrên xwe tevî pencereyên xwe paqij bikin. Rûniştvan divê piştrast bikin ku ew bi têra xwe mehên zivistanê jî di navde odayên xwe hewadar dikin (tê pêşnîyar kirin ku ji bo demek kurt pencereyê bi tevahî vebe berevajî hewadarkirina domdar a bi paceya vekirî).
- Qadên rûniştinê û razanê jî tê de, divê hemû beşên avahiyê û her wiha cihên ku bi awayekî hevbeş tîk bikaranîn û jûr (bo mînak metbex û tuwaleta hevbeş) her tim paqij bin. Eger qirêjîyek hebe, bêtir ku lê were nihêrin ka kî qirêj kiriye, divê yekser were paqijkirin. Qadên lîstîkê (bo mînak jûrên lîstîkê û etûdê) her dem paqij bin.
- Ger dema ku karmend têkevin hundurê jûrê de kesek tune be, divê ew bi rêveberiya jîngehê re û ravekirinek nivîskî li jûrê bihelin. Di rewşeke wiha de, çênabe ku ev rewş li dijî mewzûatê be û bi rêjeyê zêde cihên jiyandî teng bike yan jî bandoreke nêyînî li jîngehê û rûniştvan bike. Di her şert û mercê de, berpirsyariya van mobîlyayên ayîdî kesên ku anîne. Eger pêwîst bike, dema ew rûniştvan ji jîngehê derketin dikare ji wan were xwestin ku van mobîlyayan derbixin.
- Divê rûniştvan xalîçeyên xwe bi awayekî qewî saxlem bi zemînê ve nezeliqînin. Divê rûniştvan heftê carekê xalîçeyan bi malin û berhevandin û zeviyê mop bikin. Divê xalîçe salê carekê bi madeyên paqijiyê bêne paqijkirin (Beşa 36emîn – Yasaya Xweparastinê li dijî Enfeksiyonê – Çarçoveya Plana Hîjyenê).
- Heke ranzayên nivînan ji bo xewê neyên bikar anîn, pêdivî ye ku doşek domdar li erdê neyên danîn lê divê di nav rojê de li ser ranzayên nivînan werin hîlanîn da ku tîr hewadar bibe û ji bo ku di rewşek awarte de rêyên revê asteng nekin ku rûniştvan bi lez jûreya xwe vala bikin. Li cihê ku bi germkirina binê erdê heye, pêdivî ye ku doşek li erdê neyên danîn.
- Ji bo lawabo nexitimîn, divê xwarin û tiştên bikêrnehatî nerijînin lawaboyan. Dewçinkên mal û metbexê, bezen zarokan yê ku carekê tê bi kar anîn û berhemên paqijiyê bo tuwalet û lawaboyê neyên avêtin. Hûn dikarin vana biavêjin kîsikên çopê yê diyarkirî.
- Divê hûn baş li mobîlyayan miqate bin. Divê her keseke/î ku li jîngehê dimîne, hewil bide ku jîngeh û avahî zirarê nebîne. Eger zirar û xisarek hebe, divê yekser xebatkarê dabînkirina xizmetguzariyan bînin agadarkirin. Qedexe ye ku hûn bizmar, vîde û hilcoyan bê destûr pê ve bikin. Lêbelê, sererastkirina dîwar dikare ji rêveberiya jîngehê were xwestin û heke destûr were dayîn ji hêla xebatkarên ve tê kirin.
- Beşa 36emîn – Divê çop li gorî Yasaya Xweparastinê li dijî Enfeksiyonê – Çarçoveya Plana Hîjyenê de werin cudakirin, di kîsikan de yan jî konteynerên bi qelpax de werin civandin û rojane bêne avêtin.
- Ji bo hemu kesê/a li jîngehê dimîne çarşef, rûyê balîfê, xewlî û taximekî tepsikan tê dayîn. Xewlî her hefte, çarşef û rûyê balîfan bi kêmanî ji sê hefteyan carekê, herî kêma divê di 60 dereceyî de bînin şuştin (Beşa 36emîn – Yasaya xweparastinê li dijî enfeksiyonê – Çarçoveya plana hîjyenê)

Jîngeha Eyaletê ya Karûbarên Penaberiyê, Berlin (LAF)	Rêzikname ji bo navendên pêşwaziyê û jîngehê hevpar li eyaleta Berlînê	Rûpel 5 / 9
		Jê pêve: 07/12/2020

12. Divê rûniştvan bi xwe cilên xwe bişon.

- a. Ji bo şûştina cilan mekîneyên cilşûştinê bi awayekî bê pere dikarin bîn bi kar anîn. Ev mekîne, li gorî talîmatên xebitandinê, tenê bi deterjanê ji bo makîneyên cilşûştinê û bi awayekî hesas divê bîn bi kar anîn.
- b. Ji bo ziwakirina cil û bergan dikarin mekîneya bi tambûr ya ziwakirinê bi kar bînin. Ev mekîne, li gorî talîmatên xebitandinê û bi awayekî hesas divê bîn bi kar anîn. Ji bo ku derdor hêwî nebe, divê li cihên mayînê cil neyên raxistin. Divê cil li şaneşinê û li hil-coyên guncaw bîn raxistin û ziwa kirin.
- c. Berpirsariya rîskên şûştinê li qadên hevbeş yê jiyana ayîdî rûniştvanan bi xwe ye.
- d. Ji ziyanan û diziyê, tu berpirsariya dabînkare xizmetan û eyaleta Berlînê tune ye.
- e. Eger pirseke we hebe, dikarin bi xebatkarên dabînkirina xizmetguzariyê re peywendiyê deynin.

13. Çênabe ku heywanên kedî bêne xwedîkirin.

14. Eger haşere (bo mînak mişk û mar û kurm û kêzik) peyda bibin, divê tavilê xebatkarê xizmetguzariyê bîn agahdar kirin.

Beşa 6emîn - Xweparastina ji xir û cir û qerebalixiyê

1. Her dem heta ji we tê ji qerebalixiyê dûr bisekinin. Rûniştvanên, divê rêzê li cîranan û hevalên xwe yê rûniştvan bigirin. Bi dengekî nizm destûr heye ku li muzîkê bê guhdarî kirin.
2. Divê di navbera 10ê şeve û 6ê sibehê bê deng bin. Çênabe ku di van saetan de bi dengekî bilind xebat yan jî çalakî bîn kirin. Destûr ji bo çalakiyên bi dengekî nizm tê dayîn. Rojên Yekşeman û di betlaneyên fermî de çênabe ku bi dengekî bilind xebat yan jî çalaki bîn kirin. Alavên bi deng û enstrûmanên muzîkê divê her tim bi dengekî nizm bîn bi kar anîn.
3. Dema şibake vekirî be yan jî li derve, axiftinên li ser telefonê û yê rojane, divê bi dengekî nizm bêne kirin da ku cîranên din bêheddar nebin.
4. Divê qerebalixiyê zarokan bê îdare kirin. Hewcedariyên zarokên yê xwezayî û lîstikên wan divê ji aliyê her kesî ve bêne îdare kirin. Ligel vê yekê, dê û bavê zarokan, li hember mirovên din (li kesên ku li heman cihî dimînin, cîran û hwd.) ji zarokên xwe berpirsyar in.

Beşa 7emîn Depokirina erebeyên zarokan, bisîkletan, alîkariyên meşê û tiştên din

1. Li derenceyan û korîdorên sekinandina pusetan, pisqelêtan, alavên rêwîtiyê û tiştên din qedexe ye. Cihên derketina lezgîn û rêyên revê, divê bi şev û roj vala bimînin.
2. Pisqelêt, puset û alavên ku alîkariyê birêveçûnê dikin tenê dikarin deynin deverên ku ji bo wan hatine veqetandin.

Jîngeha Eyaletê ya Karûbarên Penaberiyê, Berlin (LAF)	Rêzikname ji bo navendên pêşwaziyê û jîngehê hevpar li eyaleta Berlînê	Rûpel 6 / 9
		Jê pêve: 07/12/2020

3. Her rûniştvanek, ji ewlehiya pisqelêtan û alavên ku alîkariyê birêveçûnê dikin û hwd. berpirsyar e. Dabînkare xizmetguzariyê û eyaleta Berlînê, di vê mijarê de bi tu awayî berpirsariyê wernagire ser xwe.

Beşa 8emîn - Ewlehî

1. Her rûniştvanekî li jîngehê, eger hat û şewatek derket, divê pabendî hemû hişyarî û rênimayên dabînkare xizmetguzariyê be û beşdarî tetbîqatên şewatan li jîngehê bibe.

2. Eger hat û şewatek derket, divê pabendiyê bi xebatkarên rewşên lezgîn bê kirin û her wiha riayetî fermanên li panoya "Şewatek derkeve divê çî bê kirin" bê kirin. Li derveyî jîngehê ji bo rewşên lezgîn cihekî civînê heye. Divê derketinên awarte û rêyên revê di her demên şev û roj de paqij bêne hiştin û barê wan ê agir tine be.

3. Rakirina an zirardayîna alarm û detektorên dûmanê, vemirandinên agir, pergalên vedîtin û alarma agir û alavên din ên ewlehiyê ji bo hemî rûniştvanan xeterek cidî ye û qedexe ye.

4. Rûniştvan divê alavên germkirin û kelandinê li derdorê bi kar neyînin. Piştî şewira bi dabînkare xizmetguzariyê re, çêdibe ku alavên bi ceryan bêne bi kar anîn. Ger ev rêgez neyê guhdarkirin dibe ku karanîna bêtir were qedexekirin. Bikaranîna dezgehên soketê yê portable an kabloyên dirêjkirinê qedexe ye, û her celebên agir vekirî qedexe ye.

5. Pêwîste ku tişt li ser pencereyên derve neyên danîn ji ber ku ev dikarin bikevin û kesekî birîndar bikin.

6. Piştî saet 10ê şeve, divê hemû deriyên derve û bodrom û deriyên têtetînê bê girtin. Pêwîste ku pencereyên di jêzemînê û derenceyan de her gav girtî bin heke ku rêkeftinê din ji hêla rêveberiya jîngehê ve nehatibe çêkirin, bi taybetî ji ber sedemên kontrolkirina enfeksiyonê.

7. Eger lembeyên ronîkirinê yê korîdora and derenceyan xira bibin, divê tavilê dabînkare xizmetguzariyê bê agahdar kirin, ji ber ku xirabûna ronîkirinê rê dide qezeyan.

8. Ji ber ewlehiyê çênabe ku destûra zarokan bê dan ku li serê nêrdewanê bilîzin. Zarok dikarin li qadên ku ji bo wan hatine terxankirin bilîzin (li jûra lîstikan, qadên lîstikê û jîngehên derveyî).

9. Her dê û bavê ku li jîngehê dimîne, ji zarokên xwe berpirsyar e. Dê û bavê zarokan berpirsyar in da ku zarokên wan pêgiriya rêziknameyê bikin.

10. Formên bi agahiyan dagirtî yê wekî **Divê di rewşên lezgîn de çî bê kirin (Pêvek I), Eger hat û şewatek çêbû divê çî bê kirin (Pêvek II), Plansaziya rewşa lezgîn (Pêvek III), Plansaziya revê û rizgarkirinê (Pêvek IV)** beşek ji rêziknameyê ne û divê her kesekî/e li jîngehê dimîne bi baldarî bixwîne û ji bo yê xwendin û nivîsîna wan tine divê dabînkare xizmetguzariyê bi awayekî bi deng bixwînin û bi wan bidin fêmkirin.

Beşa 9emîn – Berpirsari

Jîngeha Eyaletê ya Karûbarên Penaberîyê, Berlin (LAF)	Rêzîkname ji bo navendên pêşwaziyê û jîngehê hevpar li eyaleta Berlînê	Rûpel 7 / 9
		Jê pêve: 07/12/2020

1. Rûniştvan û mêvan ji zirara ku ew didin berpirsiyar in û li gorî rêzîkên qanûnî berpirsiyar in. Ev rêzîkên qanûnî ji Qanûna Sivîl a Alman (BGB) hatine girtin.

2. Xebatkarê dabînkare xizmetguzariyê yan jî dabînkare xizmeta ewlekariyê, ji xisara ku rûniştvan bidin berpirsiyar e û di çarçoveya mewzuatê de (Qanûna Medenî ya Almanî) mesûl in.

3. Eger hat kilîl/mefte yan jî çanak-anten winda bibe, çêdibe ku lêçûna wê ji kesê/a li jîngehê dimîne bê stendin.

Beşa 10emîn – Ji bo pirsgerêkan dikarin bi van kesan re têkiliyê deynin

Rûniştvan dikarin bi pirs, pêşniyar, fikar an gilî û gazincên xwe her gav bi kesên têkiliyê û ofîsan re têkilî daynin:

- Pirs, fikar û gilî yê di derbarê rûniştina li baregehê de dikarin ji rêveberiya baregehê ve an kesê têkiliyê ku ji hêla wan ve hatî diyar kirin bîn.
- Gilî li ser rewşa jîyana di wargehê de her weha dikare bi rêveberiya jîngehê re were raber kirin. Wekî din, gilî, ên bînavname jî di nav de, gava ku ew vekirî be û bixebite, dikare ji Nivîsgeha Dewletê ya Karûbarên Penaberan (LAF) re û hem jî ji Nivîsgeha Giliyan a Serbixwe ya Berlînê re were kirin.
- Koordînatoren penaberan ên li navçeyê, di nav tiştên din de li ser karûbarên piştgiriya navçeyê yê ji bo penaberan agahdariyê didin.
- Komîserê Entegrasyon û Koçberiyê yê Senatoyê di derheqê warên wekî mafê rûniştinê, pevgihîştina malbatê, proseduren penaberiyê, alîkariyên civakî, peydakirina cîh, kar, dibistan û aliyên din ên pêwendî û pêşwazîkirina penaberan de agahdarî û şîretên berfireh dide.
- Welatîyên dilxwaz ji bo ku ji penaberan re piştgiriya peyda bikin, wekî liberçavgiyê jiyana rojane, rêgezên îdarî, lêgerîna li kar û cîh û mijarên din, însiyatîfên dilxwaz dimeşînin.

Dabînkare xizmetguzariyê dê hûrguliyên têkiliyê yê têkildar li derekê li jîngehê ku ew ji hêla hemî rûniştvanan ve tene dîtin, nîşan bide.

Beşa 11emîn – Bînpêkirina rêzîknameyê û bizavên ku dê bîn cizakirin

1. Eger ev rêzîkname were bînpêkirin, dibe ku hûn ji jîngehê bîn derxistin û cihê we jî ji destê we biçe. Muameleya qedexekirinê divê nivîskî be û sedemên wê bîn diyarkirin. Biryara nivîskî ya qedexeyê dê radestî kesê / a têkildar were kirin.

2. Di dema muameleya qedexekirinê de divê pabendî bi proseduren LAFê were kirin. Wekî prensîb, tenê mafê rêveberiya jîngehê heye ku qedexeyan bisepîne. Di rewşên awarte de (dema niştêcîh an karmend di xeterê de bin) û bi taybetî heke bînpêkirinê li gorî Xala 3 ya jêrîn hebin, gerîndeyê guherînê yê karûbarê ewlehiyê her weha dikare qedexekirinê derxe ger gerîndeyê jîngehê ne li cîh be û nikaribe bi agahiyek kurt bê bang kirin.

Jîngeha Eyaletê ya Karûbarên Penaberiyê, Berlin (LAF)	Rêzîkname ji bo navendên pêşwaziyê û jîngehê hevpar li eyaleta Berlînê	Rûpel 8 / 9
		Jê pêve: 07/12/2020

Ji bo sepandina qedexeyan divê her dem du hişyariyên nivîskî bên dayîn. Piştî hişyariya sêyemîn rûniştvan tên qedexekirin. Sepandina qedexeyê tenê 3 mehan dikare di meriyetê de bimîne û tenê ji bo jîngeha heyî derbasdar dibe. Şexs tene qedexekirin ne ku tevahiya malbatê.

3. Qedexekirina yek car, taybetî dema ku xalên cidî yên di vê rêzîknameyê de bên bînpêkirin, dikare were sepandin. Qedexekirina yek car, taybetî ji bo parastina mirovên din ji êrîşan tê sepandin û taybetî ji ber van tawan û çalakiyên li jêr hatine nivîsîn dikare were sepandin:

- ji bo her cure tehdîd û fişaran (fişarên devkî jî tê de)
- Ji bo her cureyên tundkariyê (taybetî li dijî jinan, zarokan, kêmarên olî û kesên din ên destvala û aciz) yan jî dema gefa tundkariyê li hinekan bê xwarin
- Li gorî Yasaya Almanî ya Çekan, bikaranîna çekên hatine qedexekirin yan jî bazirganiya çekan û tiştên ku wekî çek dikarin bên bikaranîn (Her cureyên çekên agirbar jî tê de, her wiha kêrên ku dikarin wekî çek bên bi kar anîn jî). Eger guman hebe ku alavek qedexeye yan na, sazî dikare ji navenda polîsan ya herî nêzîk bipirse û piştrast bibe. Gerînde yê jîngehê, dikare ji we re bibêje ku navenda polîsan li ku derê ye.
- li rêxistinê û derve bazirganiya tiryakan ya neqanûnî
- her cure “zordestî”ya li dijî kesekî/ê yan jî komeke mirovan ku were dubarekirin yan jî bi awayekî asayî bê kirin, bo mînak îşkence, zirardayîn û bi taybetî jî tacîza psikolojîk ya bi ku berdewamî bê kirin
- sûcên ji polîs re hatine ragihandin Heya ku lêpîrsînên polîs berdewam dikin, qedexekirina tavilê tenê heke ku hewce bi parastina rûniştvan an karmendên jîngehê ji xeterek potansiyel hebe destûr tê dayîn.
- sûcên giran (mînak; tundiya zayendî, ziyaneke mezin a laşî, şewitandin) li jîngehê
- destdirêjîyên ku li ser hev bên dubarekirin; bo minak: ji ber ku metirsî heye ku bûyer were dubarekirin yan jî dema mezinahiya sûcî li ber çavan bê girtin, dê her du alî nika-ribin bi hev re bijîn.

Eger çek yan jî madeyên hişber yên qedexekirî li ser xwe bigerînin û bifiroşin/bazirganiya wan madeyên hişber bê kirin, yan jî dema rêzîkname bê bînpêkirin û li dijî rûniştvanan yan jî xebatkaran tundkarî bê kirin, di rewşên wiha de divê ev kes tavilê ji baregehê bên derxistin û wir biterikînin, her wiha di vî warî de merciyên berpirsyar dikarin bêne agahdarkirin û derbarê wî/ê de doz bê vekirin.

4. Rûniştvanên ku ji jîngehê hatine qedexe kirin dikarin bi personelên jîngehê re têkilî daynin da ku bibînin ka bi kîjan nivîsgehê re têkilî daynin da ku cîhek li navendek nû ya jîngehê bistînin.

5. Kesên bandorbûyî dikarin li ser qedexekirina ku ji LAF an Nivîsgeha Serbixwe ya Giliyan a Berlînê (BuBs) re hatiye kirin gilî bikin. Piştî LAF dê kontrol bike ka qedexe mafdar e an jî pêdivî ye ku were rakirin.

Beşa 12emîn- Barkirina ji jîngehê

1. Ger dema barkirina ji baregehê, ji aliyê dabînkare xizmetguzariyê ve yan jî LAFê ve nehatibe diyarkirin, rûniştvanên ku dê ji jîngehê bar bikin divê dema xwe ya barkirinê bi kêmanî 2 hefte berê, ji rêveberiya jîngehê re bibêjin.

Jîngeha Eyaletê ya Karûbarên Penaberiyê, Berlin (LAF)	Rêzikname ji bo navendên pêşwaziyê û jîngehê hevpar li eyaleta Berlînê	Rûpel 9 / 9
		Jê pêve: 07/12/2020

2. Dema barkirina ji jîngehê hat, divê kilîla derî û nasnameya wî/ê kesî/ê tavilê were radest kirin.

3. Dema barkirina ji jîngehê hat, divê hemû alavên jîngehê bi awayekî têkûz bîn radeskt kirin.

4. Dema barkirina ji jîngehê hat, ji bilî alavên ku di çarçoveya xala 3yemîn de hatibin, hemû alavên ku rûniştvanî bi xwe re anîne yan jî li ser daxwaza wî hatine divê bi xwe re bibe. Biryar e hemû alavên li jîngehê hatine hiştin bîn avêtin. Dibe ku lêçûna vê yekê ji rûniştvanan were stendin. Belgenamêyên ku rûniştvanî li jîngehê hiştine û mal û milkên wî/ê yên bi qîmet ger negihêjin xwediyê xwe, dê ji aliyê dabînkare xizmetguzariyê ve bêne hilanîn û parastin. Ji ber alavên ku winda bibin (Beşa 965ff û piştî ya Yasaya Medenî ya Almanî) mewzûat ne mesûl e. Ev tê vê wateyê ku belge û tiştên hêja yên li pey xwe hiştin şeş mehan têne hiştin û dabînkare dê hewl bide ku xwedan nas bike û agahdar bike. Ger di vê heyamê de ne mimkûn e ku meriv tiştan li xwediyê wan vegeîne, dabînkare dikare vê milkê winda kirî bavêje.